

# BULTENA ÇANDINIYÊ



## HDP

### ● Ziwayî ya di mehên borî de pêk hat ji niha ve bandora xwe li ser buhayên hilberan nîşan dide.

- Li navçeya Rihayê, Serêkaniyê donima kayê sala par bi 45 lîreyan dihat firotin, îsal buhayê donima kayê bûye 157 lîre. Di donimekî de hema bêje 150 kîlo ka derdikeve, li gorî vê hesabê fiyeta kîloyek ka hîn di meha hezîranê de 1 lîreyî derbas kiriye.
- Li gorî daneyên Konseya Şîr a Neteweyî di sala 2020'î de buhayê kîloya êmê ajalan 1,78 lîre bû, di meha hezîrana 2021'ê de ev buha derketiye 3,06 lîreyan. Li gorî van daneyan buhaya êm di 6 mehên pêşî yên sala 2021'ê de ji sedî 72 zêde bûye.
- Dîsa li gorî daneyên Konseya Şîr a Neteweyî di sala 2020'î de maliyeta lîtreyê şîr 2,07 lîre bû, ev buha di meha hezîrana sala 2021'ê de derketiye 3,13 lîre.
- Wezaretê Çandiniyê û Daristanan pesartinek, bi qasî serê lîtreyê 30 quriş bi tenê li cotkarên ku di Pergala Qeydê ya Cotkaran de qeydkirî ne, kir. Niha buhaya lîtreyê şîr di navbera 2,60-2,80 de diguhere.
- Dema em bala xwe bidin daneyên Konseya Şîr a Neteweyî em bi hêsaniyê bibînin ku hilberînerên şîr di zirarê de ne. Ji ber ku dahatên hilberîna ji maliyetên lêçûnên wekî êm, av, elektrîk û dermanan kêmtir dimîne, hilberînerên şîr ajalên xwe dişînin serjêkirinê û dev ji cotkariyê berdidin.
- Ji ber ku maliyetên hiiberîna gelek zêde ne, cotkar zirarê dîkin û nikarin sîxorteya xwe ya ziwayiyê çêkin. Wezaretê Çandiniyê û Daristanan pereyên pesartinê bi tenê dide cotkarên ku sîxortayên xwe yê ziwayiyê çêkirine. Li Tirkiyeyê 1 milyon û 800 hezar cotkar hene, lê ji wan bi tenê 20 hezar cotkar sîxorteya ziwayiyê çêkirine, lewre bi tenê 20 hezar cotkar ji vê pesartinê havildar dibin. Bi sed hezaran cotkarên ku ji vê pesartinê mehrûm dimînin an erdên xwe difroşin an jî bi deyndarbûnê hilberîna xwe didomînin.
- 
- Dolar roj bi roj li hemberî Lîreyê zêde dibe, ji ber ku piraniya lêçûnan girêdayî dolarê ne, dahatên îthalatê kêmtir dibin. Ji ber ku li Tirkiyeyê şeweyê hilberîna girêdayî derve ye, buhayên lêçûnan her tim zêde dibin. Ji ber vê yekê qezenca ku ji sewze û fêkiyên îthalkirî tê bidestxistin kêmtir dibe. Wekî mînak, li Tirkiyeyê dahata îxracata mişmişê serê tonê 860 dolar e, lê ev hejmar li Îtalyayê serê tonê 2086 dolar e.
- Li gorî rapora Rêxistina Xebatê ya Navneteweyî (ILO), di çar salên dawî de, li cîhanê hejmara zarokên xebatkar 8,4 milyon zêde bûye û ev hejmar bi tevayî gihastiye 160 milyonan. Ji sedî 70 yê zarokên xebatkar di warê çandiniyê de dixebitin. Di seranserê cîhanê de 112 milyon zarok di warê çandiniyê de dixebitin.

- Wezaretê Çandiniyê û Daristanan cihê ku pirsgirêkên hilberîneran çareser bike, mixabin ew baca îthalatê radike û pirsgirêkan li ser pirsgirêkên hilberînerên xwecih zêde dike.
- Li navçeya Ceyhanê ya Edeneyê, hilberînerê ku di sala 2020'î de erdê xwe bi buhayê 12 hezar û 732 lîreyî dida avdan, niha heman erdê xwe bi buhayê 24 hezar û 393 lîreyî dide avdan.
- Cotkar di bin deynan de ye û ew nikarin hilberînê bidomînin, li Tirkiyeyê, burokratên desthilatê yên ku nikarin çandiniyê bi rê ve bibin ji gelek cihan mûçe distînin. Midûrê Giştî yê Koperatîfa Çandinî û Krêdiyê Fahrettin Poyraz ji 11 cihên cuda mûçe distîne.
- Endeksa Buhayên Lêçûnên Çandiniyê li gorî meha nîsanê, bi salane ji sedî 22,15 û bi mehane jî ji sedî 1,71 zêde bû.
- Enflasyona pêjgehê ya ku Turk-Îş li ser xerckirina malbateke çarkesî dipêve, ji sedî 17'ê derbas dike. Di meha gulanê de enflasyona ku ji sedî 16,07 bû di meha hezîranê de derketiya radeya ji sedî 17,84 an.

## Di rêveberiyên Koperatîfa Çandinî û Krêdiyê û li şîrketên pişkdarê wî de siyasetmedarên AKP'ê bi cîh bûne.



Rêveberiya Koperatîfa Çandinî û Krêdiyê

Midûrê Giştî: Fahrettin Poyraz, parlamenterê AKP'ê yê berê

Serokê Lijneya Kargêriyê ya Koperatîfên Çandinî û Krêdiyê: Koksâl Kacir,

Serokê Karûbarên Hilbijartinê yê AKP yê berê yê Bozuyukê

Cîgirê Midûrê Giştî yê Koperatîfên Çandinî û Krêdiyê: Davût Arpa,

Serokê Milê Cîwanan yê AKP'ê yê berê yê Bilecîkê

Cîgirê Serokê Lijneya Kargêriyê ya Koperatîfên Çandinî û Krêdiyê: Ahmet

Ersoy, Di Şaredariya Islahiyyê de Encumenê AKP'ê yê berê

Endamê Lijneya Kargêriyê ya Koperatîfên Çandinî û Krêdiyê: Adem

Darimla, Serokê Berê yê Rêxistina AKP'ê ya Navçeya Akdagmadenî,

Yozgat

Endamê Lijneya Kargêriyê ya Koperatîfên Çandinî û Krêdiyê: İsmail Can,

Serokê Rêxistina AKP'ê yê Navçeya Haymanayê



Rêveberiya Holdînga Çandinî û Krêdiyê

Serokê Lijneya Kargêriyê: Fahrettin Poyraz, Parlamenterê AKP'ê yê Berê

yê Bilecîkê

Endamê Lijneya Kargêriyê: Davût Arpa, Şeewirmendê Fahrettin Poyraz

û , Serokê Milê Cîwanan yê AKP'ê yê berê yê Bilecîkê



Serokê Lijneya Kargêriyê yê Bereket Sığorta AŞ'yê: Fahrettin Poyraz,

Parlamenterê AKP'ê yê Berê yê Bilecîkê



Midûrê Giştî yê Yem a Çandinî û Krêdiyê: Hasan Fehmî Kinay,

Parlamenterê AKP'ê yê Berê yê Kutahyayê

# GÜBRETAS



## TAREKS

Serokê Lijneya Kargêriyê yê GUBRETAŞ'ê: Fahrettîn Poyraz,  
Parlamentê AKP'ê yê Berê yê Bilecîkê  
Endama Lijneya Kargêriyê ya GUBRETAŞ'ê: Zeynep Mujde Sakar,  
Endamê Lijneya Kargêriyê yê GUBRETAŞ'ê: Vahîr Kîrişçi,  
Parlamentê AKP'ê yê Berê yê Edeneyê

Endamê Lijneya Kargêriyê yê TAREKS Tohûmê: Bûrhanettîn Topsakal,  
Endamê Parlamentariyê yê AKP'ê yê Berê yê Trabzonê  
Endamê Lijneya Kargêriyê yê TAREKS Ajaldariyê: Bunyamîn Ozbek,  
Parlamentê AKP'ê yê Berê yê Baybûrtê  
Midûrê Giştî yê TAREKS Ajaldariyê: Adem Tatli, Parlamentê AKP'ê yê  
Berê yê Giresûnê  
Endamê Lijneya Kargêriyê yê TARNET'ê: Abdurrahîm Akdag, Parlamentê  
AKP'ê yê Berê  
Midûrê Giştî yê Çandinî Krêdî û Yemê: Hasan Fehmî Kinay, Hasan Fehmî  
Kinay, Parlamentê AKP'ê yê Berê yê Kutahyayê  
Endamê Lijneya Kargêriyê yê TARKÎM AŞ'yê: Mehmet Aksoy, Endamê  
Parlamentariyê yê AKP'ê yê Berê yê Dilokê

### NÊÇÎRVANÎ KUJERÎ YE!

Li Tirkiyeyê her sal bi hezaran ajalên kûvî ji aliyê nêçîrvanan ve tîn kuştin. Li Tirkiyeyê di 16 salên dawî de 17 hezar qursên nêçîrvaniyê hatine vekirin û 500 hezar kesî sertîfîkaya nêçîrvaniyê girtiye. Wezaretê Çandinî û Daristanan, her sal ji bo ku ajalên kûvî bîn qetilkirin bi hezaran îhale vedike û bi yê yekê rê li ber komkujiya ajalan vedike. Wekî ku di Peymana Biyoçeşîtdariyê, ya ku Tirkiye jî yek ji aliyê wî ye, teahûd dike; divê Tirkiye parastina ajalên ku nesla wan di talûkê de ye bisepîne û nêçîrvaniyê qedexe bike.



### Buhayên Hilberên vê Demsalê

hilber Kg	Li zeviyên Mërsinê	Hala Mërsinê	Mërsin, li ser dezgeh	Hala Stenbolê	Stenbol, li ser dezgeh
Zebes	0,30-0,60 Lire	0,40-0,80 Lire	1,5-4 Lire	0,50-1,5 Lire	2-4 Lire
Petêx	0,25-1 Lire	0,75- 1,50 Lire	3-5Lire	1-2 Lire	4-10 Lire
isot	0,50- 2 Lire	1,5- 4Lire	5-10 Lire	2-5 Lire	4 -10Lire
firingî	0,50-2 Lire	1,50- 5Lire	3-10 Lire	1,5-10 Lire	6-15 Lire
hirmî	2-5 Lire	3-7 Lire	10-15Lire	3-10 Lire	12-20 Lire
gilvaz	2-4 Lire	3-6 Lire	10-20 Lire	3-25 Lire	20-50 Lire
balican	0,25-1,5 Lire	0,75-2,5 Lire	3-6 Lire	1-7 Lire	8-20 Lire
xox	1- 3 Lire	2-4Lire	7-10 Lire	5-10 Lire	20-30 Lire
tûfrençî	2-5 Lire	3,5- 10 Lire	8-15 Lire	5- 20 Lire	15-30 Lire
bamye	5-10 Lire	7,5- 15Lire	20-30 Lire	15-20Lire	30-40Lire

### Hilberên vê Demsalê

